Pişgiriya kesên mexdur hûn cawa dikarin bikin

- Eger hûn êrişek bibînin ruyê xwe neguherin û bi rêxistin alîkariye bidin û li gor hewcedariya kesên mexdûr tevbigerin.
- Piştgiriya xwe pêşkesî kesên mexdûr bikin û agahiyê li ser xizmeta şêwirmendiya me bidin.
- Ji karê şêwirmêndiyê serbixwe em dixwazin tundîya rastgir a li Thuringenê bidin belgekirin. Ji ber vê yekê tika me ew e kû hûn di vî warîde agahiyan bidin me. Karê agahîdayînê hûn dikarin anonîm jî bicîhbînin.

Sipas ji bo bexşên we!

Mexdûrên tundîya rastgir, nijadperest û dij-semîtîk li Thuringen ê dikarin bi lez û bez û bi hêsanî ji Fon a alîkarîyê, pişgiriya aborî bistînin. (Minak; heqê parêzeran).

Dêra Protestan ya Navîna Elmanyayê
IBAN DE26520604100008000000
Bank Evangelische Bank
BIC GENO DEF 1EK1

Sîfre: Opferhilfsfonds
(FonaAlikarîyaQurbaniyan)

Ezra li Thurîngenê ji bo mexdûrên tundîya rastgir, *nîjadperest û dijî-semîtîk navende şêwirmendîya pispor e.*

Ji ber vê yekê em piştgiriya kesên şîdet lê hatinê kirin, dikin û daxwazî û perspektîfên wan bi rayagiştîre parvedikin.

Ezra- Li Thuringenê şêwirmendiya ji bo mexdûrên tundîya rastgir, nîjadperest û dijî-semîtîk.

Juri-Gagarin-Ring 96/98
99084 Erfurt
Tel: 0361-21865133
Fax: 0361-21863013
Email: info@ezra.de
Web: www.ezra.de
Facbook: @Opferberatung.ezra
Instagram: @ezra_online
Bluesky: @ezra-online.bsky.social

ezra projeyek e ku ji hêla re:solut e. V. ve tê piştgirî kirin. ezra ji hêla bernameya dewleta Thuringian ya ji bo demokrasî, tolerans û ramana vekirî „DenkBunt“ û her weha bernameya federal „Demokratie leben!“ tê fînanse kirin.

Gefördert vom Bundesministerium für Bildung, Familie, Senioren, Frauen und Jugend im Rahmen des Bundesprogramms Demokratie leben!

Die Veröffentlichung stellt keine Meinungsäußerung des TMSGAF oder des BMBFSFJ dar. Für inhaltliche Aussagen und Meinungsäußerungen tragen die Publizierenden dieser Veröffentlichung die Verantwortung.

ezra Info-Faltblatt KU / Kurdisch · 08/2025

ezra

Li Thûrîngenê Şêwirmendiya Ji Bo Mexdûrên Tundiya Rastgir, Nîjadperest û Dij-Semîtîk

ezra

ezra.de

Em Dikarin Çi bikin?

Şêwirmendî

Em şêwirmendiyek bilez û nerm pêktînin û şert û mercên ewle, ji bo kû hûn karibin serpêhatiyên xwe, li cîhê ku hûn lê ne an jî li cem me, vebibêjin, ji were avadikin. Ji bo ku hûn karibin encamên tundiya rastgir dabesînin û di rewşên krîzê de di warê pêşxistina hilbirjkên tevgerê de em dibin alîkar.

Hevalbendî

Li gor xwesteka we em dikarin tevlî hevdîtinên we yên fermî (Polîs, dadgeh hwd.) û herwiha hevdîtinên bi bijîjk, terapîst û parêzeren re, bibin. Ji bo van randevûyan xebatên amadekar piştre jî bo şopandinê bi we re axaftinan pêktînin.

Piştgirî

Em di lêgerîna we ya ji bo parêzer, terapîst û bijîjkan dibin pişgir û di serîlêdana diwarê alîkarîyên aborî û tezmînat ê de alîkariya we dikin. Em, ji bo hûn, bi kesên karibin alîkarîyê bidin we û bi kesên weka we mexdûr re karibin bikevin têkîliyê rêyan nîşanê we didin. Li gor daxwaziya we em mijara we bi rayagiştîre parvedikin. Xebatên me yên pişgiriyê li gorî hewcedarîyên we yên şexsî tên li darxistin û ger pêwistî cêbe, bi wergervanan re jî xebat têkirin.

Kî dikare bi me re bikeve nava têkîliyê?

Kesê mexdûr û nasên wan. Kesên bûne şahidên sucên tundî.

Eger

- Bi armancên nîjadperestî (Mînak; Nijadperestiya Gadjê (Nîjadperestiya li dijî Mitripan) Nîjadperestiya li dijî Misilmanan, Nijadperestiya li dijî reşikan- Efrîkaniyan.)
- Bi Armanca Nîjadperestiya li dij-semîtîk
- Ji ber tevgera we ya alternatîv û/an helweste we ya “neheq”
- Ji ber tercîha we ya cinsî û/an nasname we ya zayendî
- Ji bo armancên darwînîstên ciwakî (Mînak mirovên demêndirêj bekar û bemal, kesên seqet)
- Ji ber çalakiyên we yên dijî rastgir û ji bo mafên mirovan
- Ji ber xebatên rojnamevanî (Minak; lêkolîna li ser zext a rastgir)
- Ji ber tevgera we ya olî

Li dijî we êriş pêkhatibin, têkîliyê bi me re deynin.

Em şîdetê wekî tundîya fizîkî (birîndarkirin, kuştin, şewitandin û talankirin) dibînin û herwiha, gefxwarin, zordarî û zirar dayîna bi zanebûn a li hember mexdûran jî weka cûreyekî tundîyê dinirxînin.

Gilîkirina we ya bo rayedaran ji bo xebata sêwirmendiya me ne girînge. Di rewşên ku lêpirsîn û darizandina bûyerê nehatibe kirin jî hûn dikarin têkîliyê bi me re deynin. Ger kiryarên bûyerê polîs be jî, em karê şêwirmendîyê bicîhtînin.

0361 – 21865133

info@ezra.de

Prensîbên Me

Alîgir

Teqez em li nik we cîh digrin û gotinên we digrin cidîyê.

Serbixweyî

Xebatên me, ji rayedarên dewletê, yên dadgehê û polîsan serbixwene.

Veşartî

Hevdîtina şêwirmendiyê veşartiye. Bê destûra we tu caran ji kesên din re nayên gotin. Em li ser esasa nepeniyê kar dikin.

Bêpere

Xizmeta şêwirmendiyê bêpereye.

Anonîm

Hûn dikarin xizmeta şêwirmendiyê bê ku agahiyên xwe yên şexsî bidin, bigrin.